

Saziyên Bremenê ku hûn dikarin serî li wan jî bidin:

Mala Jinan a Bremen-Nordê

Nava rojê û bişev - Telefon: 0421- 63 64 874

Mala Jinan a Serbixwe

Nava rojê û bişev - Telefon: 0421- 34 95 73

Mala Jinan a AWO

Nava rojê û bişev

Telefon: 0421- 23 96 11

Navenda şêwirmendiyê ya ji bo Aids û nexweşiyên din ên zayendî

Horner Straße 60 / 70 28203 Bremen

Telefon: 0421 - 36 11 51 21

Navenda şêwirmendiyê ya ji bo koçberan

Am Wall 113 / 28195 Bremen

Telefon: 0421-3 37 71 88

Polîs/Kripo, Komîseriya 32

In der Vahr 76 / 28329 Bremen

Telefon: 0421- 362 38 32

Xizmeta acil a ji bo karûbarên derûnî yên civakî

Duşem-În: Saet 17:00 -21.00

Şemî, Yekşem û rojên betlanê: Saet 08:30 -17.00

Telefon: 0421 - 79 03 33 33

Navenda Şêwirmendiyê - Pro Familia

Hollerallee 24 / 28209 Bremen

Telefon: 0421 - 340 60 30

Şêwirmendiya bi riya telefonê

Telefon: 0800 111 01 11


an jî 0800 111 02 22

Weisser Ring

Sögestraße 47 - 51 / 28195 Bremen

Telefon: 0421 - 32 32 11

Hûn bi van riyên dikarin xwe bigihînin me:



notruf • Fedelhöfen 6 • 28203 Bremen

- | | |
|--|---|
| H Stasyona navendî Bremen
Tramvay: 1, 4, 6, 8, 10
Otobus: 20, 24, 25, 26, 27 û 63 | Ji Stasyona navendî heta notruf ê bi piyan 17 deqe (1,3 km) berdewam dike. |
| H Herdentor
Tramvay: 4, 6, 8
Otobus: 24 û 25 | H Rembertistraße
Tramvay: 1, 4 û 10
Otobus: 5 |
| H Schüsselkorb
Tramvay: 4, 6, 8
Otobus: 24 û 25 | H Am Dobben
Tramvay: 1, 4 û 10 |
| H Theater am Goetheplatz
Tramvay: 2 û 3 | H Wulwesstraße/Ulrichsplatz
Tramvay: 2 û 3 |



notruf

*Di rewşa şîdeta zayendî de
şêwirmendiya derûnî*

Tiştên ku divê hûn bizanibin

Ger hûn bi êrîşên zayendî re rûbirû mabin an jî destdirêjî li we hatibe kirin, divê hûn bi birînên xwe yên laşî û derûnî ve mijûl bibin.

Şîdeta zayendî li ser jiyana kesên jiyankirî de bandoreke kûr dihêle: êdî tu tişt ne wek berê ye. Encamên wê yên derûnî hîn mezintir in. Hin qurbanî de tirs çêdibin, an jî pirsgrêkên wan ên xewê çêdibin. Jiyana xwe ya rojane nikarin birêve bibin. Bêyî sedemeke diyarkirî bi hestên tund bi bandor dibin. Beyî daxwaza xwe di têkiliyên xwe de, bi hevalan re an jî bi mirovên xwe re nakokiyên jiyân dikin.

Gelek caran kesên mexdûr xwe bi xwe sûcdar dibînin an jî ji ber buyerê ji xwe şerm dikin.

Gelek caran mexdûr bi mebestên wek yan ji ber têkiliya zayendî çênebuye, yan ji ber hizirandina ku xwe neparastine an jî ji ber ku kiriyar ji berê de nas dikin, bawer dikin ku ev buyera hatiye serê wan ne „destdirêjiyeke rastî ye“. Ew dixwazin tiştê ku qewimiye zûtirîn ji bîr bikin û naxwazin derbarê buyerê de biaxivin. Hinek kes bi piştgiriya hevalên xwe an jî malbata xwe kêfxweş dibin; ligel vê hinek jî vê yekê wekî destwerdanekî dibînin û dixwazin bi tena serê xwe ji heqê vê buyerê derkevin.

Gelek mexdûrên îstîsmara zayendî bi salan nikarin baweriya xwe bi kesekî/ê bînin û bi vê yekê diêşin. Pîrî caran bi wan nayê bawer kirin an jî derbarê êrîşê de bêdeng tê mayîn. Ji ber vê yekê qurbanî bi tena serê xwe dimînin û neçarî bi xwe divê ji heqê vê buyerê derkevin.

Buyer ji kîngê ve qewimî be bila bibe hûn dikarin li cem xebatkerên notrufê şewirmendî û alikariyê bixwazin.

Gilî: erê an na?

Pîrî caran kesên mexdûr di mijara giliyê de dikevin gumanê. Ev biryar ne hewce ye ku tavi lê bê girtin. Lê di rewşên giran de tê pêşniyarkirin ku wek tedbîr muayeneyeke bijîşkî were kirin û bi vî awayî delîl bên parastin.

Li Bremenê berhevkirina delîlan bi awayekî anonîm li nexweşxaneyên Links der Weser, Bremen-Mitte û li Bremen-Nordê gengaz e. Ger hûn dû re biryara gilîdanê bikin jî, wê demê hûn dikarin encamên lêpîrsînê delîlên ku bi anonîm hatine girtin, bi dest bixin.

Ger hûn biryara giliyê bidin, bi polîsê Kripo-Komîseriya 32 re bikevin têkiliyê. Ew berpîrsiyarên buyerên bi vî awayî ne.

Ger hûn bixwazin giliyê bikin an jî ger we giliyê berê de kiribe, divê hûn parêzerekî/ê ku hûn jê bawer dikin bigirin da ku ji bo berjewendiyê we tevbigere. Mafê parêzerê/a we heye ku di lêpîrsînê de amade be û dikare dosyayên pêvajoyê binêre û bişopîne.

Serî li notrufê bidin

- ger hizirandinên buyerê dest ji we bernedin û hûn nikaribin jiyana xwe ya rojane birêve bibin.
- ger hûn xwe ji xwesûcdarkirinê nikaribin xelas bikin.
- ger hûn bêaramiya xwe êdî nikaribin ragirin.
- ger hûn bi êşên (nediyarkirî) laşî rûbirû bimînin.
- ger têkiliyên we diwartir bibin.
- ger hûn ji bo giliyê bi xwe ne bawer bin.
- ger pêdiviya we bi parêzerekî/î pîspor hebe û bixwazin em bo we yekî pêşniyar bikin.

Pêşniyar

notrufê şewirmendiya belaş a bi riya telefonê û şexsî û herweha piştgiriya derûnî pêşkêş dike. Pêşkêşiya me ji bo jin û mêran û herweha ji bo ciwanên ji herdû zayendan ên sêzdeh salî mezintir ên ku leqayî şîdeta zayendî –ji kîngê de dibe bila bibe- hatine ne. Herweha heval û mirovên kesên qurbanî jî dikarin serî li cihê şewirmendiyê bidin. Xebatkarên pîspor ên ku di xebata bi mirovên derbederbuyî re bi tecrube ne, di navenda şewirmendiyê de dixebitin. Ji bo şewirmendiyeke kesane ji kerema xwe re bi riya telefonê li ser numeraya jêr hevdîtinekê pêşniyaz bikin:

0421- 151 81

Axaftin û piştgiriya şewirmendiyê bi riya wergervanan jî dikarin bên çêkirin.

Hûn dikarin xwe bigihînin me:

Duşem-Pêncşem: saet 10 - 17

În: seet 10 - 15

Telefon: 0421- 151 81

Faks: 0421 151 00

Email: info@notrufbremen.de

Web: www.notrufbremen.de

Ger hûn di demên li jor hatine diyarkirî de nikaribin xwe bigihînin me, ev tê wê wateyê ku em di hevdîtinekê de ne. Ji kerema xwe peyameke bi dengî li ser telefonê deynin. Di rojên mesaiyê de ev peyam tên şopandin, emê li we vegerin.

Bank: Sparkasse Bremen

IBAN: DE75 2905 0101 0011 9782 85

BIC: SBREDE22XXX